Ronahî — Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :884 28-Tîrmeh- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

## "Çand û Şaristanî"



**Hediya HISÊN-Qamişlo**

Komeleya Wênekêşiya Fotografîk ya Sûrî, bi durişma "Çand û Şaristanî" û bi hevkariya radyoya Arta FM Îro (26-7-2021) li Bexçeyê Xwendinê pêşangeha wêneyan vekir.
Pêşangehê saet 11an dest pê kir û wê heta 9ê êvarê dewam bike. Armanca lidarxistina pêşangehê parvekirina çand û şaristaniya bajarên bakur û rojhilatê Sûriyê di nava gel de ye.

Derbarê mijarê de hevserokê Komeleya Wênekêşiya Fotografîk ya Sûrî Ehmed Mardenlî wiha axivî: "Berî du heyvan me ragihand ku emê pêşangeha wêneyan vekin. 57 kes ji herêmên bakur û rojhilatê Sûrî tevlî bûn û ji wan 26 wêne hatin qebûlkirin. Wêneyên me li ser çand û şaristaniya Rojava ne. Wê li sê bajaran (Qamişlo, Reqa û Minbic) pêşengeh were vekirin. Herwiha ji bilî beşa wêneyan beşa Kemereyên Klasîk jî heye. Temenê kemereyan ji 150 salî ve ye. Armanc jê ku dîroka Fotografan li herêmên me were naskirin."




Hat zanîn ku sê kesên tevlî pêşangehê bûyîn wê werin xelatkirin.

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | R | E | Ş | ■ | N | Î | V | ■ | H |
| 2 | A | ■ | E | Y | A | R | ■ | T | O |
| 3 | ■ | A | V | ■ | Q | O | S | E | R |
| 4 | A | P | Î | K | O | ■ | S | ■ | Î |
| 5 | R | ■ | N | Î | S | K | ■ | B | ■ |
| 6 | D | A | ■ | N | ■ | A | K | A | M |
| 7 | ■ | R | E | ■ | Ê | D | Î | ■ | A |
| 8 | B | Î | S | O | K | Î | ■ | E | W |
| 9 | Z | ■ | A | X | ■ | N | A | M | E |

## Xaçepirs



**ÇEP-RAST**

1. Şîrê kelandî yê havênkirî... Sala borî
2. Ne kevin... Tam, lezet
3. Roja em tê de ne
4. Bêzar û bêziman... Mehek
5. Kincekî zivistanî yê stûr û het ser piyan dadikeve... Kar û xebat
6. Lehengê destana Newrozê... Rojek
7. Kurteya elementa Aktînyûmê... Notayek
8. Yezdanekî misrî... Mehek
9. Awayê bangkirinê ya xwîşka mezin... Aşît, şape, berfende

**JOR-JÊR**

1. Hesinê li binê piyê hespan dixin... Kesê kesê guhê wî nabihîze
2. Pirç... Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku weke sembola hêzê bi kar tînin... Tîpên navî yên "saet"ê
3. Pêvek
4. Rengek... Cînava pirsê ya tê wateya; li kû ye?... Dengdêrên "pêça"yê
5. Kurtebêja otomobîlê... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe û hatî tinekirin
6. Vê carê
7. Zanayê ku paşrojê li gorî daneyên heyî texmîn dike, dûrebîn... Notayek
8. Zîl, ji kulîlkên nû vedibin re tê gotin... Cihê hêranê
9. Baneşana keserê... Kesê li meyxaneyê meyê digerîne

## Quncika têgînan.

| | |
|---|---|
| **Hêman** | **Bingeh, hîm, xîm, esas: Bernameya xwe li ser hêmaneke xurt çêkiriye.** |
| **Koalisyon** (Fransî) | Yekîtiya ji çend hêzan pêk tê, rêveberiya hevbeş: Welat bi koalisyonê tê birêvebirin. Itîlaf. |
| **Restore** (Fransî) | Çêkirina deverên xerabûyî yên avayiyekê, Nûkirin: Keleha Elodîno hat restorekirin. |
| **Rêgez** | Fikirê bingehî, baweriya bingehî. Prensîb, mebde: Rêxistineke xwedîrêgez e. Mirovekî xwedîrêgez e. |
| **Stad/Stadyom** (Fransî) | Ciyê lîstina taximan, ciyê pêşbirka lîstikên sporê, ciyê merasiman. Qad, sahe: Du taximên futbolê li stadyoma Qamişlo hatin hemberî hev. |
| **Tîm** (Ingilîzî) | Yekîneyeke futbolê û lîstikên din: Du tîmên futbolê hatin hemberî hev. Ferîq. |
| **Turnuva** (Fransî) | Rêzepêşbirkên bi dorê di navbera tîmên sporê de tên lidsrxistin. Mûsabeqe. |
| **Tûnel** (Fransî) | Riya di binê erdê de, riya hawîrdorê wê girtî: Ji bo kurtkirina rê di çiyê de tûnelek hat vekirin. |
| **Werziş** | Spor. |
| **Werzişvan** | Kesê sporê dike. |

## KNK: Em piştgiriyê didin kampanya ji bo Hewramî

**Komisyona Ziman, Çand û Perwerdeya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) bi daxuyaniyekê piştgirî da kampanya xwendinê ya bi zaravayê Hewramî.**



Komisyona Ziman, Çand û Perwerdeya KNK'ê ji bo kampanya xwendina bi zaravayê Hewramî ya li herêma Hewramanê daxuyaniyeke piştgiriyê da.
KNK'ê di daxuyaniyê de bal kişand ser girîngiya zaravayê Hewramî û got, ''Hewramî yan zarê Hewramanî yek ji şêwezarên bingehî û resen yê zimanê Kurdî tê jimartin. Belgeya yekê ya kurdî pê hatiye nivîsîn. Mixabin piştî xurbûna bayê dewlet-neteweyan, li cîhanê bi giştî gelek zimanên gelên dinyayê ji nav çûn yan jî bi awayekî sîstematik hatin piştguhxistin. Lewazbûn û piştguhxistina zimanê kurdî bi giştî û bi taybet jî çend şêwezarên resen yên weke Hewramî, Zazakî û Kelhurî di encama dagîrkirin, dabirîn û parçebûna Kurdistanê ye, li gorî pêwîst giringî pê nehat dayîn. Ji ber vê ye ku ev zarava li roja me ya îro li ber metirsiyek mezin e.''
KNK'ê herwiha kampanyaya ji bo Hewramî hatiye destpêkirin û bi bîr xist ku hewleke dilsozane ji bal rewşenbîran, perwerdekaran, çalakvanên sivîl û akincî û rûniştvanên herêma Hewramîaxêv ve heye ji bo ku zarê Hewramî li wan deveran bi fermî tevlî sîstema pêrwerde û hînbûnê bê kirin.
Em li Kongreya Neteweyiya Kurdistan–KNK'ê beşdarî vê daxwaziya rewa dibin, di heman demê de piştgiriyê li kampanyaya xwendina bi zarê dayîkê li herêma Hewraman dikin, ew kampanya ku ji hêla çendîn rêxistin, rewşenbîr, kesayet û xelkê deverê ve hatiye ragehandin.''

### DAXWAZIYA JI PARLAMANA BAŞÛRÊ KURDISTANÊ

Em daxwaziyê ji perlemana başûrê Kurdistanê û hikûmeta herêma Kurdistanê (Başûr) dikin ku dengên aliyên beşdar di vê kampanyayê de bibihîzin û bersiveke erênî ji van daxwaziyan re bidin. Her çende li 30.06.2021 bi hejmar 46 bi fermî û bo vê mebestê, nameyek ji wezareta pewerdeya herêma Kurdistanê re hatiye şandin. Em pêwîst dizanin ku girîngî bi van daxwaziyan were dayîn, êdî bi hêviya ku li sala xwendinê ya li pêş me, li herêma Hewramanê hînbûn û perwerdeya bi Hewramanî pêk were."
*ANF*

## Tûrikê Çîvanokan

***Di tûrikê me de îro sirûda li ser zarokan heye. Zarok xemla malan û paşroja civakan in. Mala bêzarok weke bostanê bêmeywe ye. Zarok ewqas şîrîn in ku dêbav her tiştî ji bo wan dikin. Ehmedê Xanî di pirtûka xwe ya bi navê "Nûbihara Piçûkan" de wiha dibêje: "Ûmîda me ji tîfalan ku me emel betalan". Ango; hêviya me zarok in, lewra kar û kiryarên me bêsûd in.***

### ZAROK

Zarok gulê baxa ne
Sêvê li ser şaxa ne

Wek kulîlkê çola ne
Pêlê ava dola ne

Xemla di nav mala ne
Xoşewîstê kala ne

Keda meh û sala ne
Li cem ap û xala ne

Gulê li ber ava ne
Hêvya dê û bava ne

Gezoya li ser pela ne
Ew paşroja gela ne





## Li Kobanê merasima bîranîna şehîdên Komkujiya Pirsûsê


Şehîdên Komkujiya Pirsûsê di salvegera 6'an de li Kobanê hatin bîranîn.R-5

## Dewleta Tirkan wiha êrişî nirxên Kurdan dike



Talana dewleta Tirkan ya li Efrîna dagîrkirî her ku diçe mezintir dibe. Vê carê kevirên goran hatin talankirin.R-5

Ronahî — Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 884 28-Tîrmeh- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî



## `Dem dema rizgarkirina Rêbertiyê û welat e`

Endama navenda Kevana Zêrîn Civîn Xelîl diyar kir ku, ji ber fikir û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li dijî desthiladariyê ye, dixwazin Rêbertiyê û gel ji hev qut bikin. *R-3*

# ´Têkiliya Kurd û Ereban dîrokî ye´

Rêxistina Geşkirin û Pêşxistinê ya Misrê bi sernavê "Di çarçoveya geşedanên rojane û zehmetiyan de girîngiya têkiliyên Kurd û Ereban", li ser internetê forumek li dar xist. Di forumê de hat gotin, têkiliyên Kurdî-Erebî têkiliyên dîrokî û kevnar in. Dosyaya kurdî jî dosyayeke mezin, bigirêk û girîng e. Herwiha hat gotin gelên herêmê bi gelê Kurd re ne.R-4






## Di çalakiyên HRE de 5 dagîrker hatin kuştin 8 jî birîndar bûn

» HRE li navçeya Şera li dijî dagîrkeran çalakiyek li dar xist. Di çalakiyê de 5 dagîrker hatin kuştin û 8 jî birîndar bûn.*R-2*

## Revandina nûnerên Rêveberiya Xweser û PYD`ê ket roja 48an



Revandina nûnerê Rêveberiya Xweser û endamên têkiliyan yên PYD`ê ji aliyê çekdarên PDK`ê ve ket roja 48an û hê jî çarenûsa wan ne diyar e. *R-2*

## Yek ji çavkaniyên parastina çanda kurdî mûzîk e

» Ciwana bi navê Lava Mistefa li bajarê Efrînê yê dagîrkirî li gîtarê dida, lê ji ber dagîrkirina Efrînê ji hêla dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê ve, nikarî vê xewna xwe temam bike. Niha xeyal dike ku vê xwenê di nava komeke mûzîkê de li Qamişlo pêk bîne. *R-7*





## Li rojavayê Dêrazorê xizmetgûzarî pêş dikeve

Komîteya Aborî û Enerjiyê ya Meclisa Sivîl ya Dêrazorê, li gundewarê rojavayê Dêrazorê 24 saetan kehrebê dide stasyonên avê û kooperatîfan da ku avê ji herêmê re peyda bike, rûbera çandiniyê zêdetir bibe û hilberîna çandiniyê jî baş bibe.*R-6*

# Revandina nûnerên Rêveberiya Xweser û PYD`ê ket roja 48an

**Revandina nûnerê Rêveberiya Xweser û endamên têkiliyan yên PYD`ê ji aliyê çekdarên PDK`ê ve ket roja 48an û hê jî çarenûsa wan ne diyar e.**




10`ê Hezîranê, çekdarên PDK`ê nûnerê Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê yê li Hewlêrê Cîhad Hesen û endamên têkiliyên PYD`ê Mistefa Xelîl Osman û Mistefa Ezîz Mistê ku ji bo pêşwaziya mêvanên xwe diçûn balafirgeha Hewlêrê, revandin.
Ji wê demê ve, tevî xwestekên Rêveberiya Xweser û PYD`ê, PDKê cihê endamên revandî û sedema revandina wan, diyar nekiriye.
Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser roja yekê ya revandina nûneran daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Em dibînin ku ev kiryar aloziyê kûrtir dike û riya diyalogê lewaz dike. Ji ber wê em hêvî dikin ku ti aliyên başûrê Kurdistanê di vê pêvajoya hesas de nekevin pey projeyên provokatorî yên ku dewleta tirkî yên derxstina şerê navxweyî." Daîreyê herwiha banga eşkerekirina çarenûsa endamên hatîn revandin kir.
***ANHA***

## Li Kobanê, Minbicê û Hesekê merasimên cenazeyên şehîdan

**Li Kobanê cenazeyê şehîd Mehmûd Hemze û Ronî Serhed li Goristana Şehîd Dîcle, li Minbicê cenazeyê Dîbo Mihemed Çawîş li Goristana Şehîdan û li Hesekê cenazeyê şervanê QSD'ê Deysem Şihada (Seyf) li Goristan Şehîd Dijwar bi merasiman spartin axê**

**KOBANÊ**
Şervanê Yekîneyên Antî-Teror (YAT) yê QSD'ê Mehmûd Hemze (Mehmûd Kobanê), 21'ê Tîrmeha 2012'an li gundewarê rojhilatê bajarê Hesekê di dema şopandina şaneyeke terorîst ya DAIŞ`ê şehîd bû. Şervanê QSD'ê Ridwan Tot (Ronî Serhad) 19'êTîrmehê di bersiva êrişa dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê ya ser navçeya Eyn Îsa de, şehîd bû.
Bi sedan şêniyên Kobanê, di gel endamên saziyên sivîl, Rêveberiya Xweser, partiyên siyasî, hêzên ewlekariyê û şervanên QSD'ê bi merasîmekê cenazeyên her du şehîdan li goristana Şehîd Dîcle spartin axê.
Di merasimê de piştî rêzgirtinê Hevserokê Meclisa Leşkerî ya Herêma Firatê Ismet Şêx Hesen şehîdên şoreşê bîr anîn û got, şehîd pêşengên me ne. Şehîd Ronî bi hezaran kîlommetre qut kirin



ku şerê DAIŞ'ê bike. Heta kesên mîna Mehmûd û Ronî hebin tirsa li ser vê xakê û ji tiştekî din nîne. Herwiha emê astengiyan derbas bikin û bigihin azadiya xwe.
**MINBIC**
Bi dehan şêniyên bajar û gundewarê Minbicê cenazeyê şehîdê Erkêxweparastinê Dîbo Mihemed Çawîş ji ber nexweşxaneya Firatê girtin û birin goristana şehîdan ya rojavayê bajêr.

Di merasima li goristanê de endamê Hêzên Erkêweparastinê yên Minbicê Xelîl Silo axivî û got, bi saya şehîdan yekîtiya me ya li dijî dijminê mirovayiyê misoger dibe. Şehîd Dîbo Mihemed Çawîş weke hevriyên xwe têkoşiya û riya azadiyê girt. Di heman demê de bi fedekariya xwe efsaneyên qehremaniyê nivîsîn.
Endama Meclisa Malbatên Şehîdan ya Minbicê Werdê Ehmed got, em îro li pêşberî çavên dijmin birûmet disekinin. Herwiha ji bo rêzdariya ji şehîdan re ku ji bo xaka vî welatî canê xwe feda kirin, em disekinin.
Piştî axaftinan endamê Meclisa Malbatên Şehîdan ya Minbicê Mihemed El-Şêx nasnameya şehîd xwend û radestî malbatê kir. Şehîd Dîbo Mihemed Çawîş di nava slogan û tililîyên dayîkan de hate veşartin.

**HESEKÊ**
Li Hesekê jî cenazeyê şervanê QSD'ê Deysem Şihada (Seyf) ku li Dêrazorê li ser erkê xwe şehîd bûbû bi merasimeke biheybet li goristana Şehîd Dijwar hat veşartin. Herwiha nasnameya şehîdekî hat ragihandin.
Di merasima li goristanê de ji fermandarên YPJ'ê Newroz Rojhilat sersaxî ji malbatên her du şehîdan re xwest û got, şehîdan ji bo azadiya gelên herêmê berdêlên giran dane, emê şopdarên xeta wan bin heta ku armancên wan pêk bînin."
Di merasimê de Meclisa Malbatên Şehîdan nasnameya şervanê Erkêxweparastinê Eseed El-Hesen yê li Hesekê li ser erkê xwe şehîd bûbû, ragihand.
Endama Meclisa Malbatên Şehîdan Rojda Ehmed nasnameyên her du şehîdan xwendin û radestî malbatên wan kirin.
***ANHA***

## Konferansa Yekîtiya Êzîdiyan ya Efrînê li dar dikeve



**Di çarçoveya amadekariya lidarxistina konferansa 4'an ya Yekîtiya Êzşdiyan ya Efrînê de li Helebê civîneke berfireh hat lidarxistin. Di civînê de endamên nû tev li yekîtiyê bûn û hevserokatiya nû ya yekştiyê hat hilbijartin.**

Konferansa 4'an ya Yekîtiya Êzîdiyên Efrînê wê 3'yê Tebaxê an go di salvegera 7'an ya komkujiya Şingalê de li Şehba were lidarxistin. Di çarçoveya amadekariya konferansê de, Mala Êzîdiyan ya Helebê civîneke berfireh li hola civînan ya beşa rojava ya taxa Şêxmeqsûd li dar xist.
Hevseroka Mala Êzîdiyan ya Helebê Gulê Xezal bixêrhatina beşdaran kir. Piştre Hevseroka Yekîtiya Êzîdiyan ya Efrînê Sûad Hiso axivî û bal kişand ser fermanên li dijî Êzîdiyan hatîn kirin. Sûad di dewama axaftina xwe de got, divê civaka Êzîdî xwe bi rêxistin bike da ku ferman li dijî wan dubare nebin. Herwiha got, ji destpêka ragihandina Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê ve, tevayiya olan, bi taybetî Êzîdiyan cihê xwe di nava rêveberiyê de girt."
Pişt re rapora xebata Mala Êzîdiyan ji aliyê Gulê Xezal ve hat xwendin û beşdaran nêrînên xwe par ve kirin. Herwiha behsa pirsgirêk û astengiyan kir û têkildarî çareserkirinê pêşniyarên xwe anîn ziman.
Pişt re Hevserokê Yekîtiya Êzîdiyan ya Efrînê Mistefa Nebo rêziknameya Mala Êzîdiyan xwend. Ji bo hilbijartina hevserokatiya Mala Êzîdiyan û endamên komîteyên wê hilbijartin pêk hat. Di encamê de Resûl Mûsa û Roşîn Mûsa wek hevserokên Mala Êzîdiyan ya Helebê hatin hilbijartin. Herwiha 9 endamên nû tev li komîteyên "Çand û Huner, Lihevanîn, Şêx, Ragihandin, Ciwan, Jin, Perwerde û Diravî" bûn.
***ANHA***

## Di çalakiyên HRE de 5 dagîrker hatin kuştin 8 jî birîndar bûn




**HRE li navçeya Şera li dijî dagîrkeran çalakiyek li dar xist. Di çalakiyê de 5 dagîrker hatin kuştin û 8 jî birîndar bûn.**

Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) bi daxuyaniyekê ragihand ku li navçeya Şera li dijî dagîrkeran çalakiyek pêk anîn û diyar kir ku çalakî ji bo bersiva êrişên dagîrkeran yên ser Goristana Şehîdan ya Efrînê pêk hatiye.
Daxuyaniya HRE wiha ye:
"24'ê Tîrmehê, di navbera gundê Meryemîn û Mereskê yên navçeya Şera de, li hemberî seyareyeke zirxî ya bi cureyê kirpî çalakiyek sabotajê hat lidarxistin. Di encama vê çalakiyê de ev kîrpî hat roxandin. Herwiha 5 leşker hatin kuştin, 8 leşker jî birîndar bûn. Ev çalakî ji bo bersiva kiryarên dijî mirovî yên dewleta tirkî ya dagîrker yên li Şehîdgeha Efrînê, hat lidarxistin."
***ANHA***

## Dewleta tirkî 2 jinên din revandin

**Çavkaniyeke herêmî ji kantona Girê Spî ya dagîrkirî ragihand ku dewleta tirkî ya dagîrker ji gundewarê kantonê du jin revandin.**

Çavkaniya herêmî ragihand ku istixbarata dewleta tirkî ya dagîrker bajarokê Silok û Turkman yên kantona Girê Spî dorpêç kirin û pişt re welatiya bi navê Emîne El-Hebîb (ji eşîra Tey ya Ereban) ji bajarokê Silokê, herwiha welatiya bi navê Ebîr Hisên El -Îsa (ji eşîra El-Bo Esaf) ji bajarokê Turkman ya kantonê, revandin.
Heman çavkaniyê da zanîn ku hêzên dagîrker her du jinên



revandîn, birin baregeheke leşkerî ya dewleta tirkî ya li Girê Spî û heta niha jî çarenûsa wan ne diyar e. Sûcên dagîrkeriya tirkî yên li kantona dagîrkirî bênavber didomin. Çavkaniyên herêmî eşkere kiribûn ku jinên kantonê di zindanên li kantonê de hatibûn işkencekirin.
***ANHA***

## Li Efxanistanê 81 endamên Talîban hatin kuştin

**Wezareta Parastinê ya Efxanistanê ragihand ku 81 endamên tevgera Talîban di encama êrişeke hewayî de, hatin kuştin**

Wezaretê da xuyakirin ku bi dehan endamên tevgera Talîban li deverên cuda li bakurê welêt, hatine kuştin.
Wezareta Hundir ya Efxanistanê jî ragihand ku 81 endamên tevgera




Talîban di encama êrişeke hewayî de ku li dijî wîlayeta Bilix ya bakurê welat pêk hatiye, hatin kuştin.
***ANHA***



# *Yek ji çavkaniyên parastina çanda kurdî mûzîk e*

**Ciwana bi navê Lava Mistefa li bajarê Efrînê yê dagîrkirî li gîtarê dida, lê ji ber dagîrkirina Efrînê ji hêla dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê ve, nikarî vê xewna xwe temam bike. Niha xeyal dike ku vê xwenê di nava komeke mûzîkê de li Qamişlo pêk bîne.**

Xewna Lava Mistefa ya 20 salî ew e ku rojekê li mala xwe ya li Efrîna dagîrkirî vegere, da ku ji bajarê xwe re bi gîtarê awazên kurdî û heskirinê rave bike.
Lava ji dema ku li Efrînê bû li gîtarê dida û niha li Qamişlo di nava komekê de ku ji 30 xwendekaran pêk tê û ji aliyê mamosteyê mûzîkê Zekeriya Dawid ve hatiye avakirin, behreya xwe didomîne. Ev kom berî sê mehan hatiye avakirin. Tê de zarok û ciwanên Kurd fêrî lêdana amûrên mûzîkê dibin, awaz û mûzîka kurdî nas dikin.

### ISRARA DI PÊKANÎNA XEWNÊ DE


Lava xwendekareke zanîngeha Rojava beşa endezyariya çandiniyê ye. Ji sê mehan ve di nava komê de perwerde dibe. Lava mûzîkê wekî tiştekî pîroz dibîne. Derbarê mijarê de wiha got: "Ji zaroktiya xwe ve ez dixwazim xwe fêrî lêdana amûrên mûzîkê bikim û dema ez mezin bûm min amûra gîtarê hilbijart."
Lava axaftina xwe wiha domand: "Dema ez li Efrînê bûm, min dest



bi perwerdeyê kir. Lê piştî êrişên dewleta tirkî em bi darê zorê ji malên xwe koçber bûn. Wê demê neçar mam dev ji lêdana gîtarê berdim. Lê bi israra xwe min careke din dest pê kir û fêrî lêdana gîtar û mûzîkê bûm."
Lava Mistefa ku di lêdana gîtarê de hestên wê bilind dibin, bang li tevayiya Kurdan kir ku fêrî mûzîka kurdî bibin û got, lewra mûzîk riya parastina çandê ye û ev xal lê zêde kir: "Mûzîk xîtabî ruh dike û riya hevgirtina mirovayiyê ya li ser rûyê erdê ye."

### PÊWÎSTIYA KURDAN BI NASKIRINA MÛZÎK Û AWAZÊN KURDÎ HEYE

Ji berê ve Kurd bi awaz û stiranên xwe yên kevnar û hunermendên



xwe yên dengxweş tên naskirin. Ji ber xwezaya pirreng ya Kurdistanê, hunermendên Kurd bi dengê xwe ya xwedî karektereke çiyayî ya bi hêz û li deştan bi dengê xwe yên nerm û tûj tê naskirin.
Dawid xwendekarên di navbera 5 heta 20 salî de perwerde dike, hin ji wan li gîtar û tembûrê didin û hin din jî li def û erabanê didin.

### MÛZÎK YEK JI RÊBAZÊN DÛRKETINA JI ŞER E

Xwendekara Zanîngeha Hiqûqê Sîwan Sado ku li amûra defê dide axivî û wiha got: "Ez pir ji lêdana amûrên mûzîkê hes dikim. Bi riya wê ez xema xwe direvînim û ji hewaya şer û nakokiyên li herêmê dûr dikevim."



Sîwan ev dirêjî da gotina xwe: "Ez gelekî dixwazim xwe fêrî lêdana defê bikim, min dema xwe bi rêxistin kiriye, çend saetan dixwînim û çend saetan jî xwe fêrî lêdanê dibim. Tevî ku dema perwerdeyê kurt e jî, lê dîsa ez hîs dikim ku cudabûneke mezin di kesayeta xwe de çêbûye."
Kurd mûzîkê wekî alaveke derbîrên dibînin ku bûyerên di dîrokê de bi wan re qewimîne mîna qirkirin, êriş û qetilkirin bi rêya stran, çîrok û efsaneyan vedibêjin. Ji lew re gelek desthilatên hakim hewl dan bi rêya helandina çand û hunerê, gelê Kurd têk bibin.
Li hemberî van hewldanan Kurdan çand û hunera xwe parast, ji ber ku çanda xwe wekî hebûn û nasnameya xwe dibîne. Heta niha jî tevî hemû hewldanên têkbirina mûzîka kurdî, lê mûzîk û stiranên Kurdî li ser bingehê reseniyê û çanda kevnar berdewam in.
***ANHA***

## 'Dengbêjî zindîhiştina dîroka jiyana kurdî ye'



**Dengbêj Yûsivê Celalî, bi kilamên xwe kevneşopiya dengbêjiyê didomîne û vê çandê her tim zindî dihêle û derbasî nifşên nû dike.**

Di dîrok û bîra gelê Kurd de cihekî girîng yê dengbêjiyê heye û hîmê wêjeya devkî ya Kurdî ye û ji sedê salan heta roja îro hatiye. Kevneşopiya wêjeya devkî ku wek dengbêjî tê binavkirin heta niha bi hezaran bûyer û çîrok bi xwe re anîne roja îro. Çanda dengbêjiyê bi awaz û terhên cuda li gorî herêman heta roja me îro xwe parastiye. Destan, berxwedan, leheng, evîn, hezkirin, xizanî, bûyerên civakî û siyasî bûne mijara kilamên dengbêjiyê. Çanda dengbêjiyê nifş bi nifş li ser axa Kurdistanê dom kiriye heta roja îro.
Weke li her bajarê Kurdan, li bajarê Wanê jî kevneşopiya dengbêjiyê didome. Dengbêj Yusuvê Celalî (62) ji van dengbêjan yek e. Ew bi kilamên xwe vê çandê timî zindî dihêle û derbasî nifşên nû dike. Dengbêj Yusuvê Celalî li gundê Alotê yê Îdirê di sala 1959'an de ji dayî bûye. Ji 8 saliya xwe ve bi rengekî bê navber klamên dengbêjiyê dibêje. Dengbêj Yusuvê Celalî demek dirêje ji Îdirê koçî Wanê kiriye û demek dirêje li Wanê dijî. Celalî di biçûkaniya xwe de tevlî dîwana dengbêjan bûye û timî guh da kilaman.

### DENGBÊJÊN NEMIR

Dengbêj Celalî diyar dike ku gava piçûk bûye ew dest bi dengbêjiyê dike û wiha axivî: "Di temenê piçûk de timî ez diçûm diwana dengbêjan û min li wan guhdar dikir. Li herêma Serhedê gelek dengbêjên bi qîmet û awaz xweş hebûn. Wê demê de jî dengbêj gelek kêm bûn. Dengbêjên berî me dikarîbûn bi rojan klamên dengbêjiyan bibêjin. Ez gelek ji dengê dengbêjê nemîr Mehmet Salîhê Şemê bandor bûme û bi awazên wî min dest bi dengbêjiyê kir. Dengbêj Mehmet Salîhê Şemê eslê xwe ji Agiriyê bû û herêm herêm digeriya û kilamên dengbêjiyê digot. Dema ku Mehmet Salîhê Şemê hate Îdirê û kilam gotin, ez gelek di bin bondora wî de mam û min ji dest bi dengbêjiyê kir. Heta temenê 21 saliya xwe min stiran û miqamên Mehmet Salîhê Şemê digot û piştî wê min Dengbêjê Nemîr Şakir nas kir û wî jî bi dengê xwe yê xweş cihê xwe di dilê min de kola. Ez teqez dikarim bibêjim ji niha û vir de ti dengbêj weke Şakirê Bedîh nayê ser ruyê dinyayê."

### 'DENGBÊJAN BI AWAZÊN XWE ÇANDA KURDÎ ZINDÎ HIŞTIYE'

Dengbêj Celalî, di çand û hunera Kurdî de bal kişand li ser girîngiya çanda dengbêjiyê û wiha pêde çû: "Dengbêjên Kurd ên nemir bi awaz û klamên xwe çanda Kurdewar heta roja îro anîn e. Kurdan çanda xwe bi dengbêjiyê, bi awayekî zelal raxistiye ber çavan. Dengbêjên Kurd hem dîroka Kurdan a nehatî nivîsîn, hem jî wêjeya Kurdan a devkî ji civaka Kurd re vegotine û dîroka Kurdî zindî hiştiye. Mirov dikare bêje dengbêjî hîmê çanda Kurdan e. Em li dîrokê dinêrin piranî dengbêjan ji derveyî karê dengbêjiyê bi ti karî ve eleqeder nebûne û tenê xwestine çanda Kurdewarî li ser lingan bihêlin. Di dil û ruhê Dengbêjên Kurd de evîna xaka Welat hebû û bi vê evînê kilam distêrîn."

### 'DENGBÊJÎ WEKE DERYAYEKÊ BÊ SÎNOR E'

Di berdewama axaftina xwe de Dengbêj Celalî tîne ziman ku dengbêjî mîna behrê ye û dibêje: "Tu çi qasî bistrê jî naqedin û weke deryayê bê sînore. Divê timî ev çanda biqîmet û dewlemend zindî bimîne. Gava distrêm aram dibim. Kêliyekê be jî derd û xemên xwe ji bîr dikim. Dengbêjî kilamên evîniyê, mirin, koçberî, lehengî, wêrekî, keserî û xemgîniyê dibêjin. Dengbêjî wekî Gola Wanê û deryayê ye. Her kilam têde hene. Usûlek wê heye û her kilamek xwedî wateyekê ye û tu dikarî li ser kilamekê pirtûkan binivîsî."

### 'DIVÊ KURSÊN DENGBÊJIYÊ BÊN VEKIRIN'

Celalî da zanîn ku astengiya herî mezin a li pêşiya berbelavbûna dengbêjiyê teknolojî ye û got: "Dengbêjî, çanda zimanê Kurdî ye. Heger berê teknolojiya niha hebûna, ê dengê dengbêjên berê li seranserê cîhanê belav bûbûna. A rast kêmaniya me di vir de dest pê dike. Divê vê çandê bidomînin. Divê em dev ji vî zimanî û dengbêjiyê bernedin. Her ku diçe çanda dengbêjiyê winda dibe. Binêre li saziyên me yên çandê qûrsên tembûr, gîtar, erbane, keman û hwd hene lê ti qûrsên dengbêjiyê tinene. Çima gelo tine ye? Ji ber ku di dengbêjiyê de pere tineye û ti kes xwe li ber dengbêjiyê re nake. Eger pereyek di dengbêjiyê de hebûya û çiqas zehmet bûya wê gelek kesan ev huner bikira. Divê di her saziyên çandê de qûrsên dengbêjiyê bên vekirin û li ser dîroka dengbêjiyê perwerdehî bê dayîn. Ez amade me ku perwerdeya dengbêjiyê bidim ciwanan û ez ji xwe bawerim. Tenê daxwazek min heye ew jî ev e, bila ev çanda bi qîmet neyê windakirin. Ji ber ku dengbêjî, şopa dîrokî ya jiyana kurdî ye."
***ANF***

## Li Tirbespiyê çalakiyên çandê

**Bi durişma "Bi çanda hîlala zêrîn û hunera şerê gelê şoreşger emê dagîrkeriyê têk bibin" Tevgera Hîlala Zêrîn di çarçoveya hefteya çandê de li navçeya Tirbespiyê çalakiyeke hunerî li dar xist.**

Di çarçoveya çalakiyên Tevgera Kevana Zêrîn yên hefteya çandê de ku li navçe û bajarên herêma Cizîrê li dar dikevin, bi beşdariya bi dehan pêkhateyên navçeya Tirbespiyê ji Kurd, Ereb û Suryan li navçeya Tirbespiyê şahiyeke hunerî li dar ket.
Şahiya hunerî li baxçeyê Qews yê li pêşiya ketina rojavayê navçeyê, li dar ket. Destpêka şahiyê beşdaran deqeyekê rêz girt, pişt re koma Stêra Zêrîn ya Qamişlo komek stiranên folklorî gotin û hunermend Evîn Bîlal ya ji Efrînê çend stiranên xwe gotin.
Koma Şehîd Delîla Agirî ya ji Amûdê stiranên foklorî pêşkêş kirin.
Şahî bi gerandina govendan bi dawî bû.
***ANHA***



# Li rojavayê Dêrazorê xizmetgûzarî pêş dikeve

**Komîteya Aborî û Enerjiyê ya Meclisa Sivîl ya Dêrazorê, li gundewarê rojavayê Dêrazorê 24 saetan kehrebê dide stasyonên avê û kooperatîfan da ku avê ji herêmê re peyda bike, rûbera çandiniyê zêdetir bibe û hilberîna çandiniyê jî baş bibe.**



Berpirsê Kehrebeyê yê Rêveberiya Enerjiyê ya rojavayê gundewarê Dêrazorê Malik El-Rebah, diyar kir ku xeteke kehrebeyê bi dirêjayiya 70 kîlometreyan ji bendava Tebqa kişandine gundewarê rojavayê Dêrazorê û ev agahî dan: "Xet ji stasyona avê ya bajarokê Cezra El-Mîlac heta gundê Şeqra yê gundewarê rojavayê Dêrazorê hatiye kişandin. Ev xet kehrebeyê dide stasyonên avê û kooperatîfên çandiniyê."

El-Rebah axaftina xwe wiha domand: "Berî du mehan me bi riya vê xetê stasyona avê ya bajarokê El-Mîlac, Cezra El-Bû Hemîd û gundên El-Zexêr û Mihêmîde û koperatîfa herêma El-Kibir û gundê Hemar El-Elî û koperatîfên gundên Şeqre xebitandin û xeta sereke û trans hatine amadekirin."

El-Rebah da zanîn ku niha li ser dayîna kehrebeyê ya gundê El-Hermoşiye û bajarokê El-Kesra xebat tê kirin. Herwiha stasyona gundê Sifêra, kooperatîf û stasyona gundê El-Sewa jî di rojeva xebata komîteyê de ne.

Komîteya Aborî û Anerjiyê hewl dide 24 saetan stasyonên avê bide xebitandin da ku av bigihîje cihê herî dûr. Herwiha rûbera çandiniyê jî zêdetir bibe û alîkariyê bidin cotkaran da ku jeneratorên kehrebeyê bi kar neynin û mazot peyda bibe û lêçûna sererastkirinê jî kêm bibe.

***ANHA***



## Li Tirbespiyê çandina kunciyan

**Cotkaran îsal li navçeya Tirbespiyê kuncî, pembû û garis pir çandin. Cotkaran herwiha bang li aliyên têkildar kir ku alîkariya wan bikin, da ev hilberîn pirtir bên çandin.**

Di cîhanê de kuncî ji hilberînên zeytê yên girîng e. Ji sedî 50 tovê wê bi zeyt e. Herwiha di-



keve çêkirina gelek xwarinan. Çandina kunciyan lêçûneke pir naxwaze, erdê baş dike û dihêle ku cotkar rêjeya çandina hilberînên zivistanê pirtir bike. Di heman demê de giyayê wan jî weke dibe êmê sewalan.

Îsal gelek cotkarên navçeya Tirbespiyê ya kantona Qamişlo kuncî çandin û heta niha rûbera hatî çandin, gihîştiye 600 donimî. Tê payîn ku ev rûber berfirehtir bibe û di salên pêş de giringiyeke wan ya taybet hebe.

Ev demeke dirêj e ku kuncî li Sûriyê tên çandin, lê ji ber ku eleqedarî bi çandiniya wan nîne, herwiha sûkek ku hilberîn lê were firotin jî nîne, çandina wan pir pêş neket. Kuncî bi du awayan tên çandin avî û bejî ku bi barana biharê tên avdan.

Kuncî nîvê meha Nîsanê û heta dawiya meha Gulanê tên çandin. Cotkar erd baş diajon, piştre bi destan tov direşînin û baş av didin. Dûv re erd baş dermand dikin û giyayên ziyanê didin tov radikin.

Xandî Sefûk ku îsal 20 donim kuncî çandine û da zanîn ku çend sal in kunciyan diçîne. Lê ji ber ku aliyên têkildar girîngiyê nadin vê hilberînê, zêde pêş neket û îsal çandina wan vegeriya weke berê.

Sefûk diyar kir ku ji aliyê aborî û xwarinê ve gelek sûdên kunciyan hene, her wiha erdê baş dikin û derfetê didin ku zêdetirî carekê were çandin. Li aliyekî din jî giyayê wan piştî berhevkirinê wek êm ji bo sewalan tê bikaranîn.

### BANGÊN JI BO PÊŞXISTINA ÇANDINA KUNCIYAN

Cotkar Xandî Sefûk got divê Desteya Çandinî û Aboriyê ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê piştgiriyê bide cotkaran da hilberînên nû yên li herêmê hatine çandin pêş bikevin û rêgeza xwexwedîkirinê jê peyda bikin.

Sefûk da xuyakirin ku cotkar gelek zehmetiyan dikişînin ku Komîteya Sotemeniyê, sotemeniyê dereng li cotkaran belav dike. Ew jî bi awayekî neyînî bandorê li çandiniyê dike.

Xandî Sefûk daxwaziya peydakirina bazarekê kir ku kunciyan tê de bifroşin, da ku cotkar teşwîq bibin ku rûbera çandiniyê berfireh bikin û welatî sûdê jê bigirin.

Ji aliyê hilberînê ve 3 cureyên kunciyan hene, hin ji wan bi 4 qulikan e, hin jî bi 6 qulikan e û hin jî bi 8 qulikan e. Cureyê bi 8 qulikan hilberîna herî baş e. Lê li herêma Cizîrê kêm tê çandin. Dema piştgiriya hilberîna kunciyan were kirin, wê cotkar tovê baş jê derxin.

Kuncî di dawiya meha Îlonê de bi destan tên dirûtin. Piştre li ser neylonê tên rêxistin û heta çend rojan li ber tavê tên hiştin. Piştî wê tên weşandin.

***ANHA***

## Li herêma Wanê çandinî û sewalkarî êdî zehmet e

**Li gel ziwabûnê, bi krîza aborî û bihabûnê re çandinî û sewalkarî êdî zahmet bûye. Welatiyên bi zorê debara xwe dikin, ev bang kirin: "Divê bihabûn bê sekinandin û biha bên xistin. Divê ji bo sewalkarî û çandiniyê jî piştgirî bê dayîn."**

Sewalkarî û çandiniya ku yekane çavkaniya debara herêmê ye û ji polîtîkayên şaş yên desthilatdariyê bi bandor bûye, îsal hişkbûnê jî lê xist. Li herêmê îsal ji ber nebarîna berf û baranê, hatineke baş nehat bidestxistin. Ji ber krîza aborî û bihayên zêde, welatiyên ku debara xwe bi sewalkarî û çandiniyê dikin jî zahmetiyan dikişînin û welatî hewl didin ku ji vê rewşê rizgar bibin.

### 'Berhem gelek caran di destê me de dimînin'

Esmer Kumlî ya ku bi rojan ji bo genimê xwe yê li qûntara çiyayê Erek yê Wanê çandiye bigire xebitî, got îsal ji ber av zêde tinebû erd hişk mane û da xuyakirin ku yekane çavkaniya debara wê cotkarî ye û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Dema em berhem diçînin gelek biha ye lê di dema firotinê de jî pir caran di destê me de dimîne. Lewra ti kes nakire. Herwiha di sewalkariyê de jî heman tişt mijara gotinê ye. Ji ber bihayê ka û êm ez pir caran hewl didim ku dewarên xwe nefiroşim. Lewra ku ez bifroşim jî erzan diçe. Lê dema ku em hewl bidin ku bigirin du kat biha ye."

### 'Pêşiya me zivistan e em nizanin debara xwe çawa bikin'

Esmerê daxuyakirin ku hevjînê wê bi salan e betal e û axaftina xwe wiha domand: "Ez bi şîrê çêlekên xwe û genimê ku me çandiye debarê dikim. Lê ne şîr û ne jî genimê me pere dikin. Wa hûn dibînin, ez bi paqijiya malê, xwarin û sewalan re mijûl dibim. Ez bi hevjînê xwe re diçim ser erd. Pêşiya me zivistan e, ez nizanim ka emê çawa debara xwe bikin. Bendewariya min ji kesî nîne. Em kedê didin, ji ber vê jî dixwazim



beramberê wê bigirim."

### 'Ji ber bihabûnê wê berhem li ser erdan bimîne'

Esmerê da zanîn ku sala boarî 100 kîlo genim ku 10 kîloyên wê bi 50 TLyî girtiye li erd çandiye û wia got: "Plana me ew e ku em berhemê zêde bifiroşin û lêçûna metbexa xwe bikin. Şsal ji ber pere tinebûn me derase neanî, me bi usula berê genim dirût. Ji ber bihabûna tê kirin wê berhemê me li ser erd bimînin. Me genim dirût lê em nikarin gazî patoz û bîçerê bikin. Divê biha bên daxistin. Divê piştgirî ji bo sewalkarî û çandiniyê bê dayîn."

***JINNEWS***

## Ser 50 salî re ye bi tenûran debara xwe dike

**Jina bi navê Şîrîn Osman Ehmed li bajarokê Şoreş yê Çemçemalê ser 50 salî re ye ji heriyê tenûran çêdike û debara xwe pê dike.**

Şîrîn Osman Ehmed di sala 1953'an de li gundê Canê yê bajarokê Tekyeya Cebarî ji dayîk bûye û niha li bajarokê Şoreş yê ser navçeya Çemçemalê dijî. Hê 15 salî, dest bi çêkirina tenûran kiriye.

Şîrîn li aliyekî zarokên xwe xwedî dike li aliyê din jî ji bo debara xwe li gel hemserê xwe karê çêkirina tenûran berdewam kiriye.

Derbarê destpêkirina karê çêkirina tenûran de Şîrîn Osman wiha axivî; "Hê ji zaroktiyê ve heskirina min ya çêkirina nanê tenûrê hebû. Wê demê xelk ji çêkirina min ya nan şaş diman. Di 15 saliya xwe de min cara yekê li Tekyeya Cebarî tenûra ji heriyê çêkir. Axa ku ez niha ji bo tenûran bi kar tînim, ji gundê Qurete yê nêzî Çemçemalê tînim. Nirxê tenûrên min 25 heta



30 hezar dînarî ye. Gelek caran jî alîkariya malbatên hejar dikim û qet pereyan ji wan nastînim. Ez ji karê xwe gelek hes dikim. Niha qet pêwîstiya min bi pereyên vî karî nine. Lê ji bo tendirustiya xwe û heskirina xwe ya vî karî, hê jî berdewam dikim."




Şîrînê diyar kir ku ji ber ku karekî baş dike, ji gelek deverên cuda yên Herêma Kurdistanê welatî ji bo kirîna tenûran serdana wê dikin.

***JINNEWS***



# `Dem dema rizgarkirina Rêbertiyê û welat e`

**Endama navenda Kevana Zêrîn Civîn Xelîl diyar kir ku, ji ber fikir û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li dijî desthiladariyê ye, dixwazin Rêbertiyê û gel ji hev qut bikin.**

**Dilîn EHMED-Qamişlo**

Li seranserê cîhanê ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, çalakî tên lidarxistin. Ji 2019 ve malbat û parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, serî li Serdozgeriya Komara tirkî ya Bursayê didin. Lê bersiv nayê dayîn.

### `Em li ser fikir û felsefeyeke azad bi rêxistin bûne`

Li ser mijarê endama Navenda Kevana Zêrîn ya bajarê Qamişlo Civîn Xelîl got, ev demeke dirêj e ne malbat ne jî parêzeran bi Rêbertiyê re hevdîtin nekirine. Ev rewş di nava gelê Kurd de fikarên mezin çêdike. Civîn Xelîl axaftina xwe wiha domand: "Armanc ji tecrîda li ser Rêbertiyê diyar e. Ji ber ku fikir û felsefeya Rêber Apo li dijî serdestî û desthilatiyê ye, hêzên navneteweyî ji xwe re xeter dibînin. Ji ber wê rojbiroj tecrîdê girantir dikin. Lê bila baş bizanin ku wê armanca wan pêk neyê, lewra em li ser fikir û felsefeya Rêbertiyê bi rêxistin bûne."

Civîn Xelîl got, ji bo ku em rêberê xwe Abdullah Ocalan ji zindana faşîstan rizgar bikin, erkê herî mezin dikeve ser milê ciwanan. Lewra Rêbertiyê ev bawerî daye me û dibêje, `me bi ciwanan dest pê kir, emê bi ciwanan bi ser bikevin`. Divê tevayiya gelê Kurd û azadîxwaz



bi taybetî ciwan, li seranserê cîhanê çalakiyên ji bo azadiya Rêbertiyê xurttir bikin.

### `Xwedîderketina li Rêbertiyê, xwedîderketina li şehîdan e`

Endama Kevana Zêrîn Civîn Xelîl bang li civaka navneteweyî kir ku, li hemberî vê neheqiyê çavê xwe veke. Civîn axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Li hemberî planan û ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, divê gel li ser piyan be. Lewra xwedîderketina li Rêberitiyê, xwedîderketina li xwîna şehîdan ne. Ji bo hêzên navneteweyî ku guh û çavên xwe girtine, banga me ew e ku, vê neheqiyê bibînin û qebûl nekin. Divê bi wijdan erkê xwe pêk bînin. Herwiha ez bang li ciwan jin û mêran yên azadîxwaz dikim ku, Rêbertiyê baş nas bikin û bibin şopdarên xeta felsefeya azad. Êdî dem hatiye ku em welatê xwe ji bindestiyê rizgar bikin û bi Rêberitya xwe re jî azad bijîn."

## Kesên ku keda wan nayê dîtin: Kedkarên demsalî

Kedkarên demsalî ku li her bajarê diçinê di serî de êrşên nijadperestan bi her awayî neheqî li wan tê kirin û keda wan tê xwarin, xebateke di bin şert û mercên zor û zahmet de bi ser wan de tê sepandin. Kedkara demsalî Elîf Bîngîn ya ku li konên kedkaran yê biçûl ku li Edenê ye dimîne diyar kir ku li Tirkiyê zahmetiyên mezin kedkarên çandiniyê yên demsalî dibînin.

Li Tirkiyê li gel krîza aborî xizaniya jinan jî zêde dibe. Vê pirsgirêkê jî herî zêde kedkarên çandiniyê dibînin. Li gel ku bajarên çandiniyê ne jî ji ber ku qadên çandiniyê nemane her sal ji herêmê bi sedan kedkarên demsalî berê xwe didin bajarên ku çandinî li wan tê kirin. Ev kedkar li bajarên ku diçinê jî di serî de nijadperestî bi gelek pirsgirêkan re rûbirû dimînin û di şert û mercên xirab de xebat bi ser wan de tê sepandin.

Kedkarên demsalî ku ji Şirnexê hatine edenê ji bo bixebitin jî heman pirsgirêk derdikevin pêşiya wan.

### 'Kedkarên çandiniyê zahmetiyan dibînin'

Ji sedan kedkarên ku ketine ser rê yek jê jî Elîf Bîngîn (26) pirsgirêkên ku derdikevin pêşiya wan vegotin. Elîfê diyar kir ku ji 10 saliya xwe ve dest bi xebatê kiriye û heta cihê ku biçinê jî wê gelek pirsgirêk derkevin pêşiya wan. Elîfê axaftina xwe wiha domand: "Li Tirkiyê herî zêde karkerên demsalî zahmetiyan dibînin. Em serê sibehê zû radibin heta ku tarî dikeve erdê dixebitin. Em li ber germa zêde ya havînê dixebitin. Em havînê ji ber germê û zivistanê jî ji ber sermê di nava zeviyan de gelek zahmetiyan dikişînin. Konên me jî konên herî xirab in. Em li cihên bê tendirust dimînin. Me dixwest ku ji kedkarên demsalî re jî xanî bên çêkirin. Em kincên xwe bi destên xwe dişûn."



### 'Em heqê keda xwe jî nagirin'

Elîfê diyar kir ku ew heqê keda xwe nagirin û wiha got: "Bavê min berî bi salan jiyana xwe ji dest da. Ez li gel dayîk û birayê xwe dimînim. Niha ez tenê dixebitim. Li cihê me derfetên kar nînin. Eer li bajarê me derfetên xebatê hebûna em nedihatin vê derê. Em ji ber pirsgirêka debarê tên. Bi heqdesteke kêm em hewl didin fatûrayên ku her roj zêde dibin bidin. Rojane em 80 TL digirin. Tenekeya dohnê xwarinê di bin sedî re nîne. Em ji ber bihabûnê nikarin debara xwe bikin. Em ji sibe heta êvarê dixbitin bi pereyê digirin dikarin çend lib zeyetûn bistînin. Em nikarin pêdivyên xwe pêk bînin."

### 'Barê jinê girantir e'

Elîfê diyar kir ku barê jinê yê kar girantir e û wiha dawî li axaftina xwe anî, "Tu diçî malê jî dixebitî. Zahmetiya herî mezin jî jin di vî warî de dikişînin. Bar tev li ser pişta me jinan e. Civakê ev bar daye ser milên jinan mixabin."

***JINNEWS***

## Konferansa duduyan ya Meclisa Jinan ya malbatên şehîdan hat lidarxistin

**Bi durişma "Têkoşîna Jina Azad, Parastina Nirxên Şehîdan û Misogeriya Şoreşa Rojava ye" konferansa duduyan ya Meclisa Jinan ya malbatên şehîdan ya rojavayê kurdistanê, hat lidarxistin.**

Konferans li navenda Çand û Hunerê ya Aram Tîgran ya li bajarokê Rimêlanê hat lidarxistin. Di konferansê de 400 delegeyên ji navçe, bajarok û bajarên rojavayê Kurdistanê û nûnerên rêxistin û saziyên jinan ji herêmên Firat û Cizîrê, amade bûn.

Di konferansê de gelek axaftin hatin kirin. Herwiha nirxandinên Rêber Abdullah Ocalan û rapora salane ya Meclisa Jinan hat xwendin û li ser wer hat nîqaşkirin.

Li gorî komîteya amadekar ya konferansê, wê rêziknameya hundir were erêkirin û jinûve sazûmaniya Meclisa Jinan ya malbatên şehîdan ya Rojava were avakirin.

***ANHA***





## Sûcên li dijî goristanan

**Binevş SARYA**

Di rastiya jiyana mirovan de, yan jî em dikarin bêjin bi awayekî giştî civak bi nirxên xwe yên kevnar tên naskirin û li ser koka xwe şîn dibin. Mirovayî ji roja şoreşa gundan dest pê kiriye û li hin waran niştecihî dane destpêkirin heta roja me ya îro, li û ji dayîk bûne li wir eger jiyana xwe ji dest dabin bêguman li ser axa pîrik û kalikên xwe hatine binaxkirin. Bêguman cihê ku mirov lê ji dayîk bûye dixweze li wir were veşartin. Lê mihxabin rastiya ku em îro tê de dijîn ne demeke wisa ye ku mirov li kû ji dayîk bû li wir were binaxkirin. Ji ber sedemên şeran, desthiladarî û talanan mirov neçar dimînin ji gundên xwe û axa xwe koçberî hin deverên din bibin. Lê rewşa gelê Kurd hê ji ya van rastiyan hemûyan jî cudatir e. Em zarokên welatekî wisa ne, ku her roj li ser axa me şer, pevçûn û dagîrkerî bênavber tê meşandin. Şerên ku li ser me jî tên meşandin ne şerên adil û ji rêzê ne. Ya rast jixwe mirov nikare navê adilbûnê li ti şeranan bike. Eger nav bû şer, kuştin û talan ti adîlî li ortê namîne. Lê qet nebe di demên kevin de mirovan bi hêza milên xwe û aqil li dijî hev şer kiriye. Lê di roja me ya îro de dewletên dagîrker balefiran radikin, roketan jî qazanên du ton, yan jî çar ton di ser serê mirovan da dibarînin. Ew roket bi hezarên caran ji giraniya bedena mirovekê/î girantir e. Lê li dijî bedena mirovan ew wehşet tê jiyandin. Di nava van şeran hemûyan de em zarokên vî welatî tekoşîna jiyanê didin. Pir zihimet e ku mirov li ser axa xwe bêwelatiyê jiyan bike. Ji milekî ve em tên koçberkirin, ji milê din ve jî dagîrker nahêlin hestiyên me jî di bostek axa me de bimînin. Di dema şerê Efrînê de ez jî yek ji wan şahidên wê demê bûm. Goristana ku ev çend roj in dewleta tirkî ya dagîrek û çeteyên wê weke gora komî yan jî komkujiya ku ji milê rêveberiya xwser ve hatiye kirin dide diyarkin û hestiyên me ji wan deran derdixe û dibe cihên ne diyar. Ew goristan, yan jî pekrewangeh ya zarokên vî gelî ye. Ew kesên ku di wan goran de hemûyan ji bo azadiya Efrînê şer kir û şehîd ketin. Hinek ji wan jî li ber deriyên malê xwe, li kolanan yan jî li ber deriyê nexweşxaneya Avrîn di encama topabarana dewleta tirkî de hatin kuştin û gel ew di nava rengên kesk, sor û zer de pêçan anîn li wê derê veşartin. Lewra di wan rojan de gel nikarî biçe gorstana kevin ya şehîdan ji neçarî cenazeyên şehîdên şerê berxwedana serdemê li wir dispartin axê. Gel li bendê bû rojekê bajarê wan ji dagîrkeriya dewleta tirkî rizgar bibe û cenazeyên zarokê xwe bibin gorstana şehîdan. Lê dewleta tirkî ne tenê axa vî welatî dagîr dike. Ew gorstanên me jî talan dike. Li Bakurê Kurdistan hestiyên zarokên vî gelî ji goran derxstin kirin binê asfaltan, gorstana Serê Kaniyê kirin cihê depoya pembû û bi dehan gorstanên şehîdên vî gelî xerab kirin, cenazeyên zarokên wan birin cihên ne diyar. Armanca dagîrkeran ew e ku ti şopên rastiya neteweya Krud li ser rûyê vî welatî û vê axê nehêlin. Gelê ku zulim lê were kirin, hestiyên miriyên wan ji bin axan werin derxistin û hemû şopên wan yên jiyanê werin tinekirin û dijiminê wan hewl bide navê wan di nava rûplên dîrokê de tine bike jî, lê ew gel heta dawiyê li ber xwe didin û hebûna xwe misoger dikin. Gelê Kurd yek ji gelên herî kevnar yê vê axê ye, wê ti hêz nikaribin gelên qedîm yên van axan di nava rûplelên dîrokê de bidin tinekirin.

# Foruma têkiliyên kurdî-erebî

Rêxistina Geşkirin û Pêşxistinê ya Misrê bi sernavê “Di çarçoveya geşedanên rojane û zehmetiyan de girîngiya têkiliyên Kurd û Ereban” li ser internetê forumek li dar xist. Di forumê de hat gotin, têkiliyên Kurdî-Erebî têkiliyên dîrokî û kevnar in, dosyaya kurdî dosyayeke mezin, bigirêk û xwediya giraniyê ye. Her wiha hat gotin gelên herêmê bi gelê Kurd re ne.



Di gel gelek rewşenbîr û akademîsyenan, Mûdîrê Edîtoriya Rojnameya Ehram ya Misirê Fethî Mehmûd, lêkolînerê akademiyê yê karûbarê siyasî–Iraq û Sekretêrê Giştî Yê Komeleya Erebî Ya Piştgiriya Doza Kurdî Dr. Teysîr El-Alosî, Serokê Partiya Sosyalîst ya Misirê Ehmed Behaedîn, çalakvana hiqûqî ya tunisî Selwa Qîqa, Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê Bedran Çiya Kurd, rêvebera Komeleya Emel ya Kerkûk-Iraq parêzer Sirûd Ehmed, nivîskar û şîrovekarê siyasî yê misrî Recayî Fayid, profesorê li zanîngeha Belqa ya Urdinê Dr. Ridwan Îzolî, şîrovekarê siyasî Dr. Muhîb Saliha, Serokê Rêxistina Koalisyona Navneteweyî ya Maf û Azadiyan–Parîs Mihemed Îsamîl El-Şamî, rojnamevan û nivîskarê ji Tirkiyê Berekat Kar, parêzerê iraqî Mihemed El-Selamî, nivîskar û rojnamevanê urdinî Redad Ilyas El-Qelab û çalakvanê siyasî yê filîlstînî Yasir Ebû Seydo beşdarî forumê bûn.

Forum ji aliyê Rewşen Qasim û Dr. Muxtar Gebaşî ve hat birêvebirin. Di forumê de mijarên weke, “Di vê demê de çima pêwendiyên Kurd û Ereban?”, “Li hemberî destwerdanên ser herêmê rola Ereb û Kurdan” û “Paşroja danûstendinên Kurd û Ereban” û “Rola civaka sivîl di çalakkirina diyalogên Kurdî-Erebî de” hatin nîqaşkirin.

Fethî Mehmûd girîngiya xurtkirina têkiliyên kurdî-erebî destnîşan kir û wiha got: “Li gel guhertinên ku li herêmên Rojhilata Navî dibin, pêwîstiya me bi xurtkirina têkiliyên kurdî-erebî heye. Li herêmê guhertin dibin, ji ber vê yekê pêwîstî heye ku em têkiliyên kurdî-erebî careke din di ber çavan re derbas bikin. Lewra gelek xeter li pêşberî her du gelan hene. 3 proje hene; projeya tirkî, projeya îranî û projeya Israîlê, lê projeya erebî nîne. Ev her sê proje li ser Kurdan gef in.”

Recayî Fayid jî têkiliyên kurdî-erebî bi van gotinan nirxandin: “Têkiliyên kurdî-erebî kevin in, lê hikumetên ku herêm bi rê ve birin komkujî li dijî gelên herêmê bi taybetî li dijî gelê Kurd kirin. Hêzên navneteweyî jî li hemberî gelê Kurd û yê Ereb bûne yek. Vê jî bandoreke mezin li têkiliyên kurdî-erebî kir.”

Fayid diyar kir ku Kurd bi cihên xwe yên cografî li pêşberî dewleta Tirkan ya ku welatên Ereban qut dike dibe bend û wiha domand: “Îran jî hewl dide dest dayne ser herêmê. Ji ber vê yekî divê têkiliyên kurdî-erebî werin xurtkirin. Her gel li pêşberî zêdegavî û xetera çeteyên DAIŞ’ê xeta parastinê bû. QSD’ê roleke sereke di tinekirina DAIŞ de li Sûriyê lîst.”

Recayî Fayid girîngiya pêşxistin û xurtkirina têkiliyên her du gelan destnîşan kir.

Bedran Çiya Kurd diyar kir ku pêvajoya ku herêm tê re derbas dibe berpirsyariyên dîrokî dixwaze û wiha got: “Divê têkiliyên kurdî-erebî yên xwedîkokên dîrokî yên qedîm werin xurtkirin û di her pêvajoya jiyanê de werin tevgerkirin. Hevgirtina her du gelan ya li hemberî dijminayiya Osmanî nîşana vê ye.”

Çiya Kurd da zanîn ku piştî avakirina dewlet-neteweyan, têkiliyên kurdî û Erebî xirab bûn û pêkanîna siyaseta “Parçe bike tuyê bi ser bikevî” bandoreke neyînî li têkiyên her du gelan kir.

Çiya Kurd bal kişand ser projeya neteweya demokratîk û got, ev proje ji bo pêşxistina têkiliyan û çareserkirina pirsgirêkan çareseriya herî guncaw e.

Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi domdarî wiha got: “Pir eşkere ye ku Osmaniya dagîrker ji bilî karesetan tiştekî din di pey xwe nehişt, nemaze piştî ku ji bo çûna ber bi Ewropa ve bêçare man. Osmaniyan bi navê fethê derbasî welatên islamî bûn, komkujî li dijî gelên herêmê kirin û demgorafiya wan guhrtin. Niha jî dewleta Tirkan hewl dide mîraseya Osmanî zindî bike. Ji ber wê bi hincetên cuda destwerdanê li Sûriy, Iraq, Lîbiya, Yemen û Misirê dike û destekê dide komên dijwar.”

Bedran Çiya Kurd bal kişand ser sûcên ku çeteyên dewleta Tirk li dijî gelê Kurd pêk tînîn û got, dewleta Tirkan destek da komên çete, komkujî li dijî gelê Kurd û gelên din yên li Sûriyê bi taybetî li dijî Êzîdiyan pêk anîn. Ji bo pêkanîna van komkujiyan hincetên bêbingeh afirandin.”

Çiya Kurd got, divê li hemberî gefên Tirkiyê ya ku dixwaze xîlafeteke nû ava bike têkoşîn bê kirin. Gelên herêmê Kurd, Ereb û Suryan ji bo rizgarkirina herêmê ji terorê fedekariyeke mezin kirin, van pêkhateyan sîstemeke siyasî nenavendî ava kir ku yekîtiya xaka Sûriyê misoger dike.”

Berekat Kar jî diyar kir ku li Rojhilata Navî zêdetirî 40 mîlyonî Kurd hene ku di nava gelek welatan de hatine dabeşkirin, gelek gel hene, mîna gelê Kurd û gelê Filistînê hê mafên xwe bi dest nexistine. Berekat diyar kir ku mafê Kurdan heye çarenûsa xwe diyar bikin.

Hiqûqnasê ji Îranê Salih Nikabîx da xuyakirin ku di nava gelên li Rojhilata Navî de têkiliyên xurt hene, ji berê ve û heta niha Kurdan li gel Ereban şerê êrişkaran kir. Nikabîx diyar kir ku dewleta Tirkan û Îranê di sedsala borî de hewl dan bandore li têkiliyên kurdî-erebî bikin, da ku herêmê kontrol bikin û di dema dawî de destek dan komên terorîst.

### DOZA KURDÎ JI DOZÊN GIRÎNG LI HERÊMÊ YE

Muhîb Salha diyar kir ku dewleta Tirkan cîrana Sûriyê ye û hewl dide demografiya herêmê biguherîne û diyar kir ku doza kurdî ji dozên girîng li herêmê ye û çawa ku gelê Kurd bi gelên Ereb re li ser dirêjahiya dîrokê piştgiriya avakirina şaristandiyê kiriye, divê gelê Ereb jî bi mafên dîrokî yên gelê Kurd ava bike.

Teysîr Elosî bal kişand ser aktîfkirina rola yekîtiya kurdî-erebî û aktîfkirina xîtaba nû ya li rêgezên hevqebûlkirinê û wiha got: “Divê itîraf bi çarenûsa gelan were kirin û li gorî rêxistina siyasî ya di dema niha de ji nû ve koalisyona kurdî-erebî ya kevnare vegere, divê kongreyeke berfireh ji gelê Kurd û Ereb re li dar bikeve, divê piştgiriya gelê Kurd were misogerkirin û wek gelê hebûn û xaka wê heye di NY’yê de were qeydkirin, ji wê zêdetir jî piştgiriya diyaloga neteweyî ya kurdî were kirin.”

Elosî spasiya gelê Kurd li ser qurbanên ku ji bo têkbirina DAIŞ’ê dane kir û wiha domand: “Şerê Kobanê piştî şerê Stalîn Grad duyemîn şerê mezin e, divê gelê Kurd mafên xwe di pergala konfederal de wergirin, divê gelê Ereb fişarê li rejîmên Ereb, rejîmên Îran û Tirkiyê bikin. Herwiha divê pêşî li siyasetên dewleta Tirk ên berfireh li Rojhilata Navî were girtin. “

### ROLA CIVAKA SIVÎL DI AKTÎFKIRINA DIYALOGA EREBÎ-KURDÎ DE

Li aliyekî din jî Sirûd Ehmed bal kişand ser rola rêxistinên civaka sivîl di geşkirina têkiliyên di navbera gelê Ereb û Kurd de, di navbera tevayiya pêkhateyan de, her wiha behsa wêneyê di zihniyeta gelê Ereb de li ser gelê Kurd hatiye avakirin û pêwîstiya zanakirina gelên herêmê li qebûlkirina çandên din, kir.

Girêdayî mijarê, çalakgerê hiqûqî Mihemed El-Şamî bal kişand ser têkiliyên kurdî-erebî û da zanîn ku dosyaya Kurd dosyayeke mezin, giran û girêk e, lê gelên herêmê bi mafên gelê Kurd re hevgirtin û garantor in.

El-Şamî wiha got: “Divê kar li ser projeya xebata erebî-kurdî were kirin, divê gelê Kurd taybetmendiyên xwe nexşe bike û pêşniyar bike û emê bi hemû derfetên xwe di civînên navneteweyî de piştgiriya wî bikin. Her wiha pêşniyarkirina fikireyê ew e ku foruma niha bibe destpêka projeya xebata hevbeş ya kurdî-erebî.”

El-Şamî diyar kir ku wek saziyên civaka sivîl li derve danasîna mafên gelê Kurd, doza wî û parastina wî dikeve ser milên wan. Lewra Kurd neteweyek e ku li gel wê çand, dîrok û xaka wan heye û wiha dawî li gotina xwe anî: “Em vê yekê bi hevriyên xwe yên ji gelê Kurd li derve û hundir re parve dikin.”

*ANHA*

# Birayê Mistefa Osman: Divê PDK rewşa birayê min zelal bike

**Birayê endamê Têkiliyên PYD’ê Mistefa Osman yê ji aliyê PDK’ê ve hatî revandin, bang li hikumeta başûrê Kurdistanê kir ku tavilê çarenûsa birayê wî û endamên din yên hatîn revandin zelal bike û got, PDK ji çarenûsa birayê min berpirsyar e.**



Bertekên gelê Rojava yên li hemberî revandina nûneran didomin.

Ev 49 roj in ku PDK`ê nûnerê Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê yê li Hewlêrê Cîhad Hesen û endamên têkiliyên PYD`ê Mistefa Xelîl Osman û Mistefa Ezîz Mistê revandine.

Birayê endamê Têkiliyên PYD`ê Mistefa Xelîl Osman, Nezhet Xelîl Osman wiha got: “Birayê min ti sûc nekirine ku were revandin. Tişta kirî çûye balafirgeha Hewlêrê da pêşwaziya şandeyekê bike ku ji bo serdana Rojava hatibû. Lê berî ku derbasî balafirgehê bibe hêzên asayişa Hewlêrê revandine.”

Nezhet Osman diyar kir ku birayê wî ji dema hatî revandin ve ti agahî jê negirtine û bang li desthilata başûrê Kurdistanê kir ku sedema revandina birayê wî û cihê wî eşkere bike. Osman da zanîn ku biraziyên wî li Hewlêrê li benda vegera bavê xwe ne.

Osman da zanîn ku xebata birayê wî ya di qada têkiliyên derve de li seranserê welatên cîhanê xebateke rewa ye û nivîsgeheke xebata wan ya fermî li Başûr heye û ev nirxandin kir: “Em ji van kiryarên PDK`ê yên li hemberî Kurdan mat dimînin.”

Osman bang li PDKê kir û wiha axivî: “Ev ne demokrasî ye ku tu birayê xwe yê Kurd bigirî û bixî girtîgehê û ti agahiyan nedî malbata wî. Demokrasî ew e ku tu bihêlî birayê te bi serbestî bê qeyd û bendan bijî û bibe piştgirê rakirina zilma li ser wî û malbata wî.”

Nezhet Xelîl Osman hêvî kir ku PDK helwesta xwe ya li hemberî Kurdan di ber çavan re derbas bike û wiha dawî li axaftina xwe anî: “Ev dema ku em tê re derbas dibin pir hestiyar e, bi taybetî di vê demê de hewldanên pêkanîna yekîtiya Kurdan tê kirin, PDK bi van kiryarên xwe yên parçebûna di nava Kurdan de zêdetir dike, her wiha kiryarên PDK`ê belavbûna di nava partiyên kurdî de zêde dike.”

*ANHA*



# Li Kobanê merasima bîranîna şehîdên Komkujiya Pirsûsê

Şehîdên Komkujiya Pirsûsê di salvegera 6’an de li Kobanê hatin bîranîn.



Merasima bîranînê ji aliyê Tevgera Komûnîst ya Şoreşger û Tevgera Jinên Komûnîst yên Şoreşger ya Herêma Firatê ve li Navenda Çand û Hunerê ya Baqî Xido hat lidarxistin. Bi dehan şêniyên bajêr beşdarî bîranînê bûn.

Ji bo bîranîna şehîdan deqeyekê rêz hat girtin, pişt re sinivîzyonek derbarê şehîdan de hat pêşandan.

Paşê endamê Tevgera Komûnîst ya Şoreşger Erdal Cibo axivî û got, sala 2015`an sala eşkerekirina planên dewleta dagîrker bû ku hewl dida dengê azadiyê qut bike.

Erdal Cibo ev xal li axaftina xwe zêde kir: “Şoreşa Rojava rê li pêşiya gelê bindest vekir da ku li dijî zilmê serî hildin û dengên xwe bilind bikin, di heman demê de mizgîniyeke mezin da gelê herêmê da ku ji fikirê şovînîst rizgar bibin.”

Cibo da xuyakirin ku li her dera ku dengê azadiyê lê hebe dewleta tirkî hewl dide wî dengî qut bike û axaftina xwe wiha domand: “Armanca dewleta tirkî eşkere û zelal e, dixwaze gel di tariyê de bijî. Komkujiya Pirsûsê şahid e ku dewleta tirkî fikirekî nû yê xwînmij hilgirtiye û dest bi komkujiyan li dijî Kurdên li bakurê Kurdistanê kiriye.”

Di dawiyê de Koma Botan ya girêdayî Navenda Baqî Xido stiran pêşkêş kirin.

20’ê Tîrmeha 2015’an, li ber navenda Çandê ya Amara ya navçeya Pirsûsê ya bakurê Kurdistanê êrişeke bombeyî li dijî kombûneke ciwanan pêk hat. Êriş dema ku ciwanan amadekarî dikir ku derbasî Kobanê bibin da ku diyariyan pêşkêşî zarokan bikin, pêk hat û di encamê de 33 ciwan şehîd bûn.

*ANHA*

## Çalakiya greva birçîbûnê di roja 244an de ye

**Çalakiya greva birçîbûnê ya li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û binpêkirina mafan ku 27’ê Mijdara 2020’î li girtîgehên Tirkiyê û herêmê hatibû destpêkirin di roja 244an de dewam dike.**





Çalakiya greva birçîbûnê ya li dijî tecrîda ku 22 sal in li Gîrtîgeha Tîpa F ya Îmralî li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dike û binpêkirina mafên girtiyan ku 27’ê Mijdara 2020’î ji aliyê girtiyên PKK’yî û PAJK’ê ve li girtîgehên Tirkiyê û herêmê hatibû destpêkirin di roja 244an de dewam dike. Çalakiya ku ji 5 rojan carekê dewrî komeke din dihat kirin ji 14’ê Tîrmehê ve ji 15 rojan carekê dorveger bi koma 47an dewam dike.

### Çalakî li Yewnanistanê di roja 206an de ye

Çalakiya ku penaberên li Kampa Lavrîo ya Yewnanistanê dimînin jî ji bo bidawîkirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya çalakiya greva birçîbûnê ya li girtîgehan ku dabûn destpêkirin jî dewam dike. Ev çalakî 206 roj in didome. Tevgera Ciwanên Şoreşger (TCŞ), Tevgera Jinên Kurdistanê ya Ewropayê (TJK-E) û Navenda Çanda Kurdistanê pêşengiya çalakiyê dikin.

*ANF*

## Dewleta Tirkan wiha êrişî nirxên Kurdan dike



**Talana dewleta Tirkan ya li Efrîna dagîrkirî her ku diçe mezintir dibe. Vê carê kevirên goran hatin talankirin.**

Li gorî Rêxistina Mafê Mirovan ya Efrînê komên çete yên girêdaayî dewleta Tirkan goristana li gundê Şêxorzê talan kirin. Hat gotin çeteyên Tirkan kevirên goran rakirine, wan difiroşin yan jî li baxçeyên malan datînin, ku ev mal jî yên gel in û dest li ser wan danîne.

Ji Adara 2018’an vir ve li Efrîna dagîrkirî her tiş tê talankirin. Binesazî, kanên me´denan û milkên taybet bi rengekî sîstematîk tên talankirin. Herwiha ev êrîşa sîstematîk li ser goristanan jî dibe. Goristana Avesta ku dema êrîşên dagîrker şervan û sivîl lê hatin veşartin, pêşî hatibû talankirin û ajansa fermî ya dewleta Tirkî AA gotibû goristan ya sivîlên kuştî ye. Lê di demeke kurt de rayedarên Efrînî û dîmenan ev îdîa derew derxistibûn.

*ANF*

## BE´ES, Esed û hesreta Sûriyeya kevin



**Zekî BEDRAN**

Beşar Esed di axaftina merasima sondxwarinê ya piştî hilbijartinê de, derbarê çareseriyê de axaftineke baweriyê bide nekir. Tersê wê bi helwesteke çawa ku bi ser ketibe dîsa dubare kir ku wê her tiştî weke berî 2011an bimeşîne. Bi piştgiriya Rusya û Îranê li ser piyan ma. Lê di rewşa heyî de Sûriya roxiyaye û heta dawiyê parçe bûye. Wê çawa bi ser hev ve were, wê Sûriye çawa were cem hev û wê çawa dawî li dagîrkeriya Tirkî were? Ev mijarên sereke tev li benda bersivê ne.

Esed bi taybetî dixebite ku Kurdan piçûk bixe, wek dijmin û ajan ragihîne û bi wî rengê rewşa xwe xurt bike. Dibêje Kurd ji ber dagîrkeriya Tirkan reviyan û li ber çavê wan dagîrker li ser erdê Sûriyê digerin. Ev tê wateya ku Kurdan ayîdê xwe nabîne. Ew Kurdên ku behsa wan dike welatiyên Sûriyê ne. Û Kurdan li Efrînê, Serê Kaniyê, yan jî li Reqa ne ku êrişî artêşa Sûriyê kir û ew der xistin destê xwe. Berî Kurdan artêşa Sûriyê dev ji wan deran berdabû. Bakur-rojhilatê Sûriyê ne ji destê rejimê hat derxistin. Li hemberî DAIŞê û çeteyên din rejimê xwe negirtibû û ji herêmê derketibû. Esed çima hîç behsa vê nake! Kurdan û gelên herêmê yên din ew herêm ji destê DAIŞê rizgar dikin.

Divê girêdana bi gel, dîrok û rastiyê ve hebe. Weke din dema Tirkan êrişî Efrînê kirî artêşa Sûriyê kariya bi Kurdan re li hemberî Tirkan şer bike. Lewra ew herêm di fermiyetê de erdê Sûriyê bû. Mafê Sûriyê hebû ku sînorê xwe û erdê xwe biparêze. Lê rejimê ev nekir. Ku gel ne di binê desthilatiya wê de be wê dengê xwe ji dagîrkirinê re jî neke. Tişta di pratîkê de bûyî ev bû. Weke din li hemberî dagîrkeriya Tirkan Kurdan bi qehremanî li ber xwe da. Hêza wan ya hewayî tinebû. 58 rojan berxwedaneke dîrokî kirin. Bi hezaran şehîd û birîndarên Kurdan hene. Eger ew êriş li ser rejimê bibûya ewqasî li ber xwe nedida. Digel ku hêza rejimê ya hewayî hebû jî li Idlibê li heberî Tirkan li ber xwe neda. Eger ne ji Rûsya bûya êrişên Tirkan nedisekinîn. Jixwe di encamê de weke Efrînê ew de ne di destê Sûriyê de, di binê dagîkeriya Tirkan de ye. Rejima Esed Kurdan bi ajantî û leşkeriya bipere ya Amerîka pênase dike. Halbiku Kurd her tim dibêjin ji bo hevdîtinan, yekîtiya Sûriyê û çareseriya pirsgirêkan em amade ne. Lê zimanê rejimê zimanê dûrxistin û dijminiyê ye. Her tim serî li rêbaza erzan, miliyetgiriya erebî dide. Halbiku pirsgirêk ne pirsgirêka Kurd û Ereban e. Pirsgirêk pirsgirêka azadî û demokrasiyê ye. Pirsgirêkên nava gelan de nînin. Çawa ku li bakurojhilatê Sûriyê tevayiya gelan, baweriyan û çandan di nava aştiyê de û di nava hev de dijîn.

Eger Kurd dijminên rejimê bûna û li hemberî wê şer bikirana wê niha rewş cuda bûye. Yek ji sedemê sereke ku rejim ku rejim li ser piyan maye ew ku Kurdan li hemberî rejimê şer nekiriye. Tirkan ev bi ser Kurdan de pir sepand. Ji ber ku Kurd tevlî itîfaqa wan nebûn bûn hedefa Tirkan. Weke din propagandaya ku Kurd ajanên Amerîka ne, berûvajîkirineke mezin ya dîrokî ye. Kurdan Amerîka venexwendiye. Dema Kobanê di binê wê êrişa mezin de eger rejim û Rûsya bihatana alîkariyê wê Amerîka niha ne li Sûriyê bûya. Jixwe rejimê berdabû çûbû. Rûsya alîkariya Kobanê nekir. Amerîka di çarçoveya stratejiya şerê li hemberî DAIŞê de hat alîkariya Kobanê. Gelên bakur-rojhilatê Sûriyê bi koalisyonê re li heberî DAIŞê şer kirin û herêm wisa paqij kirin. Hevkariya bi Amerîka û koalisyonê re sirf dijberiya DAIŞê bû. Heta niha jî ev hevkarî li hemberî rejimê nehatiye bikaranîn. Ji bo wê ku rejim Kurdan û gelên herêmê bi alîgiriya Amerîka sûcdar dike berûvajêkirina rastiyê ye.

Esed û rejima BEESê li hemberî rewşa Sûriyê ya niha xwe hîç berpirs nabînin. Ji bo xwe kêmayiyeke herî piçûk jî qebûl nakin. Halbiku Sûriye di binê rêveberiya BEESê de ket vî halî. Sûriye ne ji aliyê Kurdan yan hin din ve dihat meşandin. Eger sûriye xwediya rêveberiyeke demokratîk bûya, herî kêm wê pirsgirêk bihatana gotûbêjkirin. Sûriye hilweşiyaye û beşeke girîng di binê dagîrkeriyê de ye. Di gel wê gelên Sûriyê nikarin tevlî nîqaş û çareseriyê bibin. Rejim riya nîqaşê nahêle. Rejim dibêje yan hênê stûyê xwe xwar bikin, yan hûn xayîn û maşika hêzên derve ne.

Divê êdî rejima BEESê vê fêm bike; eger gelê Sûriyê xwediyê rêveberiyeke demokratîk bûya, ev serhildan û şer dernediketin. Niha jî şertê yekê yê kombûna Sûriyê û gihatina yekbûnê pêkhatina azadiyê û avakirina sîstemeke demokratîk e. Her ku rejim ji vê direve pirsgirêk pirtir dibin û hêzên derve jî pirtir destê xwe dixin navê. Ku tu li Şamê rûnî û kesên din sûcdar bikî Sûriye rizgar nabe. Gelê Sûriyê xizan e. Bi milyonan koçber in. Dewlemendiya Sûriyê di nava çend malbatan û derdoreke teng de tê parvekirin. Di parvekirinê de edalet nîne. Ma vê jî hêzên derve dikin? Ji bo wê erk dikeve ser milê rewşenbîr, welatparêz û derdorên demokratîk. Divê ev derdor di paşroja Sûriyê de erkekî çalaktir bigirin ser milê xwe.